www.efrin.net/kurdi

Bera pir nêzîk
lê pir dûr bim

HELBEST

Ebdulrehman Efîf

JI TE HEZ DIKIN

Ew ji berî salekê de li ber derî ne
Ew dixwazin ko ji berî salekê de li ber derî bana!
Ko heta mirinê ji te hez kiri bana
***
Dema tu bihatayî ewê bimirana.
Û tê winda bû ba
Ji bo li mirina xwe bigeriyana!
***
Dixwazin bi qîrînekê dirêj hezkirina xwe bibêjin
Û naxwezin jî,
Ji bo her tiştî winda ne kin
Dixwazin her tişt yê wan ba
Û li ber derî salekê sax bisekiniyana
Her tu derketayî lêvên te yên tenik,
yên bêhêz bi dilşewatî maçî kirana

Wek ko ev heye salek sax te ne dîtine…!
Û her tu vegeriyayî
wek ko ev heye salek sax ew bêyî te ne !
***
Zanin bê ew çiqas tehl û zehmet e bê te
***
Tu mûmek î li paş derî
Tu şevreşiya zengelorkên wan dişewitînî
Û ew diqîrin wek dînan
- Em ji te hez dikin
Hinek ji wan li ber derî man
û yek piçekî dûr çû û hat...
***
Diva wan yekî pştî yê dî ji te hez kiri bana
lê wan bi hev re ji te hez kirin
- Ji wilo pêve nikarî bûm!!
***
Lêvên xwe yên tenik
yên bêhêz bide wan!

ji bo di wan de lêvên dêyên xwe û
xwhên xwe maçî bikin
yan helbestekê şor...
Destên xwe yên nazik bide wan
ji bo dilê xwe yê mezin nas bikin
ji bo hezkirina te wek balîfekê
têxin bin serên xwe yên porsipî
yan destên te wek kulîlkan
têxin guldana jiyana xwe...!!?
***
Hinek ji wan li ber derî man
û yek tenê piçekî dûr çû û hat
lêvên te maçî kirin
tê bêje -
Ew deriyê mala wî bûn
Tê bêje -
Wê te bicarekê re winda kiri ba.

SÛZANAYÊ

1

Hemû yên ji te hez dikin bi çavên
min li te dinerin
Hemû yên ji te hez kirin bi destên
min destên xwe digihînin te
Hemû yên ji min hez kirin bi destên
te destên xwe digihînin min
Û ez kevirekî birîndar im li pêşiya te,
ez kevirekî kevn im li pêşiya te...
kevirekî bi hezar aliyî li pêşiya te...

2

Veqetandî me ji çiyayekî tije
bêdengiyeke fireh

Veqetandî ji girine tije bêdengiyeke mezin
Veqetandî ji giyanekî tije zengilên bêdeng
Hinek ji bayê êşê bes e
Ji bo ez bibim çiyayekî fireh
Tije bêdengiyeke fireh

3

Laşê te yê nayê nas kirin yê zihîf wek pelê darê
Tu li ser min dihêlî tê bêje ez Dar im!!
Laşê te yê nayê nas kirin yê zihîf tu li kêleka min dihêlî tê bêje ez dêyek im!!
Laşê te yê spî, yê zihîf tu li ser min dihêlî tê bêje
ez ewrek im !
û wek ewrekî tu min maçî dikî
Tê bêje ez guldank im!
Yan jî lawê te me ... !!
Yan ez jibîrkirina ko ji nivkê ve tê bîra te li vir ...

Wek laşekî zihîf î din...
Wek bêrîkirinekê xurt î din.

4

Hezkirina te bi şev maçî min dike, bê ko ez zani bim
Destên min dihesirîne bê ko ez zani bim
Hezkirina te di daristanê de dimeşe bi tenê, ji bo li nêzîkî hêlanan bigihê min
Ba li porê wê yê kurt dixe
Hezkirina te bi şev maçî min dike bê ko ez zani bim
li min dinere bê ko ez zani bim
Hezkirina te carna ji te bêtir ji min hez dike
Naxwaze dev ji min berde ji te bêtir şevekê dirêj min maçî dike
û te ji bîra dike...

5

çilo tê bibe wextekî çûyî ji min re

6

Tama devê te gulek mezin e

7

Sûzanayê kenekî hêdî hêdî wek fêkiyekî distewe
Kevirekî boz e li ser kêleka devê min
Pelekî fireh ji ba
Destek berî min ji xew radi be û devekî kûr maçî min dike
Ronahiya ko çayê çêdike û rûdinê ji bo tiliyên min ruhnî bike
Pozê hestiyên min bêhn dike
Hevdîtinek e bi salên ji maçîkirinan pê tê kêf kirin.

LI GULÊ GERIYAM

(Dîwarê axê
ko tu wî nabînî
û xaçirêk jî te nabîne
dara tiwa a ko di xewna te de bû
çûkên wê bi hêsirên xwe ji te re distiran.
Emê kengî vê çîrokê ji bîra bikin?
Tu û ez...)

Bera dara tiwa bibe baran
Baran bera bibe hewşek mezin

Bera hewş bibe gîha û bera gîha jî
Bibe havîn!!
Bera em bimirin
hey dilê kevir
Ey havîna girover…

Dûrî destê te
Bê ba
bê nerîn
Bê xwe...
Ez te nabînim
Di binê darê de me
Ez piçikê şevreşê
Dicûm…

Nalîna bilûra berbangê
Xwîna gumlekê tenûrê
Û hêsirên mezrîbê
Fistanê te yê ji xwîna qitikan
Bi ser pozê min de
Bi ser sînga min de
Hey lê...

Hêkên destên te zû ji min difirin
Ber bi Qamişlo de
Memikên te dişkin
Ber bi Qamişlo de
Tiliyên te min ji bîra dikin
Ber bi Qamişlo de
Lêvên te yên qeresî
Dîsa pêsîrên te yên pembo
Li serê pozê min
Ber bi Qamişlo de
Baskên tiliyên nigên teeeeee
Ber bi Qamişlo de...

Vê êvarê min te dît
Kêfa kolanê hat
Lempa mala bavê te vêket
Sêv hiliya ...
Evîn bi ser

Min de
Şemitî...

Min di xewnê de
Destê xwe avêt bejna te
Lê gulek ket destê min
Ez şiyar bûm
Li gulê geriyam
Min te dît...

Min di xewnê de
Maçî gulekê kir
Lê gul ne ştexilî
Bi bihna te buhirî
Di ber xewnê re

Ji hesreta lêvên te
Firinde li ser aso civiyan
Gazin ji dara buharê
Ya dirêj û tarî dikirin

Digiriyan û lepûşkên dilên xwe di axê de didan
Nikilên xwe li bin guhê kevirê evînê
Dixistin û baskên xwe diperpitandin
Xwe reş dikirin ji bo ko lêvên te
Sipî bi ser wan de
bibarînin...

Bera dara tiwa bibe dara hinara
Û sînga te lêkeve
Bera gul bibe sînga te û sînga te bibe
Xanî û nan
Û xwarin bibe tu
Û hêsir bibin bexçe..

EZ HELBESTEKÊ ÇÊDIKIM

1

Dar dirêj in wek xwe timî
Rok tenê ye, pêwistî xelkê ye
Xwe li ser gir dirêj dike

2

Ez û te
Her yek li mala xwe ye
Tu çayê çêdikî û
Ez xwe ji te re dikelînim :
Ez helbestekê çêdikim

3

Min tama memikên te nema dît
Nema çavên te yên wek hingulîskan vemirîn

4

Ka emê xwe wek daran tazî bikin
Emê pelên xwe ji xwe biweşînin
Û di mirêka wan de, bera jiyan li me binere!!

5

Xwîn nahêle
Bê laşê te yî step
Her tişt xiliyaye!

6

Ez nema dikarim te bibêjim
Gulistan, destên şînkayî, tiliyên avê

Wênekêş
Nikare di min de te bibîne
Matmayî dimîne
- Ev bi kê re dişţexile!?

7

Cadên teng ên berî êvarî
Ma pêwîst e ez navê bajar jî bêjim?!!
Lavlavk li hewşinan bi ser dîwar de
xwar dibe
Keçikine bi kirasine bi rengine - hîn
di bala min de ne-
zer û sor
- Ma gelo tu di nav wan de bûyî?
Ev çend sal hene, ko ez vê pirsê ji
xwe dikim
Û hertim
Di erênayê de me..!!

8

Wê helbest çi bikin ji te
Wê dûmankê bi dora te xin

Wê gumlekekî qetiyayî û pentelonekî
Jihevketî li te kin...
Wê te bibin ser avê û te tî û birçî
Bavêjin ser riyan
Û hertim wexta paîyz baskê xwe li eniya te xe
Tê baskê wî bi hêsiran lê vegerîne
Û wextê ko havîn roka xwe li nav çavên te xe
Tê dîn û har bibe...
Tu rê li ber te tine ne
Hew tu karî carina xwe di çavên mûzîka pişti
Nîrwekê de veşêrî, an
Di kêlîkekê ji kêlîkên dawiyên demsalan
Baz bidî…
Tê timî bi xemgînî li teyr û tilûran binere
Û her ko tu xweşikbûnekê bibînî
Tê hezar carî li ber bişikê
Û xwîna te wê gulên cîhanê gişî av bide
Heta tu bimiçiqî û tu bixwe bibî

Helbest…

9

Teşqelên sîkê û ev minara han
Û gulên di hewşa minarê de û camî
Û destê te yî xweşik, xwendina bekelorya,
Zivistan û havîn û dîsa buhar…
Hingulîsk, jinanîn,
Berdan û teşqelên helbestan û ruhniya tarîbûna
Xweşikbûna te,
Ev hemû bes in ji nivîsandina pirtûkekê re !!?
Yan ezê çawan bikim!?
Ezê her tiştî ji bîra bikim û te tenê...
wê hezkirna te
Wek azana berbangê hilkişe û hilkişe
Zelal û xurt, wê zengilê canê miriyan
Ji xewê rabike.

10

Ez bitenê di vê newalê de
Avek pir hindik ji lehiyê vemaye
Belkî xarek pirreng jî di binê
kortikekê de be
Belkî kerek ji dûr ve bizirre
Belkî mêwên tirî ên biçûk hinekî ling
û şaxên xwe berdin bi vî aliyê çem
de…
Her tişt tenê ye, wek ko ew aniha,
berî deqakê çêbûbe
Hertişt wilo tije ruhnî ye
Tê bêje qey Xwedê di hindurê her
tiştî de dirame!!

11

Tê vegere dawiya sîkê
Dawiya gulê
Dawiya maçîkirinê
Giş pir xweş in…
Tê vegere pêşiya dil
Pêşiya pênûsê
Pêşiya evînê

Tê vegere pêşiya stranê di wî bajarê biçûk de
Wek çûkekî
Tê destê xwe bide perîkê wî
Nikilê wî
Tê hinekî din xwe nas bike
Tê giroverekê çêbike
Û di wê de tê vegere ortê
Tê vegere xwe
Pêşî û dawiya her gulê…

12

Em bi salan bijimêrin an bi deqan an bi kolanan??
Em bêjin tu wek kîjan darê yî ? Wek kîjan kulîlkê yî ?
Em bi çend xwînrijînê ji te dûr bikevin
.....
Em bi kîjan şevê kevin, bi kîjan hezkirinê kevin??

Bi heft û deh salan kevin, û em te nebînin…
Şevreşa dawetê û ne ruhniya te û ne meşa te û ne kirasê Te
Û ne lêvên te û ne silava te û ne maçîkirinek û ne bidestgirtinek
Û ne hunglîskek û ne û ne
Û ne êvarek bi te re , ne ştexaliyek, ne kenek, ne bişirînek
Ne hinek fediya te , ne hinek şêrînbûna te
Ne henekek !

13

Wilo bi baskekî şikestî ji payîzî
Bi şibakak dûr î tenê
Bi hink pirtuqal û êvarekê sar
Û mûma li ser masê her xwe liba dike
Li ser rûye te ... li ser mirinê û tenêbûnê û
Ser rûyekî din ko di bin her rûyî de ye:

Rûyê agirê mûmê bixwe…

14

Aniha tenê ez dikarim rê bibêjim
Ew rêya tarî û hişk
Ji ber ez hinekî nerim bûme
Ji meşê û windabûnê...

15

Hinek hinar
- Gelo ev ne bes in ji bo avakirina
Dilekî ko bi evînê şewitiye?
Sipîbûn û nermahî û şêrînbûna
hinekî tirş
Tirşbûna memkên te
Di rojên dawiya havînî de!

16

Ezê bi qurmê daran rabim û bi
baskên hezar û dused çûkî
Xwe li bin guhê baranê xim bo
steyrik li hawîrdora me Birijin

Bo ev rê tije tirs û evîn bibe
Û hew ên pir bi heyv kari bin di vir
re derbas bin û bistirên
Û hew ên pir dîn…

17

Ezê di xwe de rêya bexçê Xwedê
nas bikim..
Navên melayketên mezin û baskên
wan wê bi refan
Li hev bikevin dema ji keçikek
insanan hez bikim
Nabên mixabin! Wê rûnên li ber
deriyê dil, wê bendewariyê
Bikin... bi navên xwe yên giran, bi
baskên xwe yên dirêj
Pir bi bêhnfirehî, bi xweşikbûn û
nermahiya komek dayikan…

18

Berî ko destên te herin bi ber êvarî de û ez ne mînim
Û tu bêdeng li pel û qorziyan binerî
Av û henfiya avê bi hêsirên dawiya havînî û derdora dibstanê.
Tu nikarî di stiriyan de û di dîwarê nizim de bigihêjî û di hewşa me yî biçûk.
Tu gelek tiştan winda dikî- bi wan re tu xwe winda dikî
Û tu nizanî!?
- **Her tiştê tu ne bînî , tu xwe nabînî !**
- **Her tiştê tu bêhin nakî, tu xwe nikarî bêhin bikî !**

Wê roj li ser canê te giran bin, buhar û perîk û deng…
Dengê moxilê û şihîran û dengê mêşên hingiv û zarokan
Her tişt giran e . Bi zorê tu karî hinekî binerî bê girî
Bi zorê tu karî hinekî li ber vî çiyayê şevê ê madtehl rawestî
Dora te li te dinere û bi dengê hêsiran dar bilind dibin...

19

Tenê asoyek fireh û darine dûr û ruhniyek diweşe
Tenê qîrînek di hindurê te de bêdeng
Û zivistanek dadikeve ser mijankên te wek perdakê tenik
Tenê tu li hev dikevî wek agirekî şîn û teyr bi nikilên xwe li guhê
Ezman dixin û ba dibare.
Tenê wek guldanekê bihna evînine kevin û pelên birînên şîn
Ji te belav dibin...
Çakêtê te û dûmana çixara te
Bêrîkên te yên sar, tiliyên te yên bi xemgîniyê serxweş
Tu li dora xwe dinerî
Ma ez li kû me?
Ma ez bi kû de dirim !?
Tenê û qîrwîra demsalan li ser rûyê her kevirî dinale
Pelên rojan xeyidîne û ewr
Û rozname perpitîne

Birînên deh evînên bêjiyan xwe li her alî dilebitînin.

20

Wilo bêdeng tu hatî û ketî guldanan
Te xwe wek minminîkekê danî li ser bera malê
Û te pencerên biçûk dîtin û dara hinaran
Te steyrik ji xwe re li hewşê xwendin û bi ştlên rîhanê re ştexilî
Te xwe wek ezmanekî vekir û hevalan gişa ji ruhniya birînên te vexwarin
Te wilo xwe dirêj kir ko beran û hingulîsk bi te wek sibehekê keniyan …
Te xwe bi deriyan û qorzîkên malê da razandin
Nîriwa malê, girar û bexdûnisê malê û nêrdewana ko xwe
Dirêj dike û dibe stûna ezman
Tenê di pştî nîrwekê de, piçikek rok li tiliyên te dixe

Piçikek ba li porê te wek lewenta difitile..
Tu tije barê havîn û çûk û heçheçîkan devê xwe vedikî
Bê ko tu zani bî zêrê êvaran di te de serxweş dikeve
Û qeresî ji birînine te li serşokê dirijin..
Tu di nav ruhnî û tarîtiyê de piçik piçik nas dikî:
Te hîn li bilûra xwe yî dawî ne xistiye
Lê zenglê berbangan bi ser te de dibarin
Gulên hîro û steyrik te li mala te dinixumînin..

21

Berî ko ev bask bi dengê firê keve
Berî gul bi bihna baranê keve
Û ez bi lêvên jibîrkirinê kevim..
Berî em hew xwe di memikên gulan de bibînin

Ev hewş bibe ba û me di dawa xwe de biperpitîne
Berî tu wilo ji me hez bikî û wilo me dûrî xwe bikî
Ka ji me re bêje: Ez hûn im,
Ka bêje:
Hûn ez im!!

22

Werin bera sîkên tirên û guhên baranê we bînin
Bera evîn we li kêleka xwe bibîne, bitenê werin
an giş bi hev re !! Bera rêyên xortbûna we, we di teşqelê xwe de Veşêrin. Win kî ne bê van teşqelan?
Werin bera indeko we di gwîzlikên xwe de veçirîne..
Bera xanî we ji xwe re lêkin û gambelek we nikil bikin
Bera ev newala avê xwe di we de mirêk bike û mirîşk
Di bêrîkên we de hêkan bikin. Werin bera stiran dirêj be

Bera dew tîr be, bera hesp bihîrin û
kulîlk di hezkirinê de
Ji êşa xweşbûnê binalin.
Werin bi çavine bişewq an çavine
vemirî. Wê dar we bibişkivînin
Wê havîn we hildin ser lingên we,
wê ewr we bibarîne û winê
Di kirasê xewê de razên wek bihna
berfê, disa biçûk
Di pêçeka ruhniyê de...

BERA ROK LI TE BINERIN

Çal

Ez bi valabûnekê mezin hest dibim
Hezkirin jî nikare vê çalê dagire
Girî û mirî jî nikarin!

Nifir

Çima timî emê dev ji hezkirinê berdin
Ji bo dûra em bera dû bidin û em wê ne girin
Helbet hinkan nifirek li me kiriye

Ko em xwe di bazarên vala de bibînin
Û di qutîkên ba de!?

Bi herî

Çiqasî ev rok şêrîn e
Divê tu helbest li ser neyên nivîsandin
Yan na !!
Wê helbest van baskên gulê bike bi herî…

Çiçikek

Xwezî ez di hindurê gulê de mêşek bama
Xwezî ez wilo ji xwe re di bexçê wê de bigeriyama
Û min ji her alîkî çiçikek rakira…!

Pitpit

Çima kes nema helbestan dixwîne
Ko kesek pitpitê bike
Ma kî wê lê guhdarî bike
- **Wê hinek lê guhdarî bikin**
- **Ji bo ji bîra bikin bê ew çiqasî mirî ne!!.**

Bikujim

(Ez dixwazim xwe van rojan bikujim
Ev jiyan pir giran bûye li ser dilê min!)
Hinekî bihna xwe fireh bike!!
Û derkeve bera rok li te binerin

Baş e

Bi şev
Dema her tişt wilo bê wate ye
Steyrik şkestine
Heyv digirîn
Dar di hindurê te de dişewitin

Hîn şewitandinek heye
Baş e
Gelekî baş e !

Deve û sed hesp

Birevîn!!
Vê keçikê birevîn
Bera hîjdeh deve û sed hespên bavê
wê li te bigerin
Bera wextê tu di ser de bî !!
Bên û te bikujin.

Xwîn

Ranezê!!
Bîst rojan ranezê
...
Di helbestan de razê!!
Tiliyên xwe bike bi xwîna pênûsê

Derkeve!
Bera bayê herî sar li cegerê te xe
Û bibe kulîlkên bi ser bejna xwe de şkestî
Bibe fîrefîra kuxika gotinê.

Pilopilo

Ezê têkevim bin destê nîşanên pir kevin
Wê min bikin xefk
Ji bo lawirên nedîtî bên û têkevin qirika min!
Bo bexçên tirabêlkê û pilopilo ên nîrwê
Xwe di bêhna min de sobelanî bikin..

Nifşê çûyî

Nifşên çûyî xwe di şkeftan de vedişartin

Wê çiya xwe di min de veşêrin
Nifşên çûyî diçûn nêçîriya xezal û gamasiyan
Niha wê gamasî û xezal û keroşk
Bên nêçîriya min…

Livîn

Min wextê te didît
Ez dihatim malê û zû diketim nav ciyan
Ji bo ez bîranîna te ji xwe re zeft bikim
Ma gelo min ji bîranîna te pirtir hez dikir?
Min wextê te didît ez dihatim xwe...
Û min helbestek dinivîsand
Te tu tişt ji helbestê ne dibir
Te nikarî bû ew vexwara
Ne bixwara û ne li xwe kiri baya
Tu tenê dimayî
Û helbest bi tenê dima
Û ez bi bîranîna te re bûm
Di nav livînan de…

Dinivîsand

Wilo paîyzek diqede :
Pencereyek timî vekirî
Û ruhniyek hindik
Tu rûnişтî yî li ber wê pencerê
Tu ne evîndar î
Tu ne karekî dikî
Tu saet 11 ji xew rabûyî
Tu xwe piçikekî xwar dikî
Li ser dara raserî te
Li hewşê teyrek hinekî mezin û
qirikşîn baskekî xwe bilind dike
Û nikilê xwe li bin dixe
Tu çend rêzên din ên helbestê
dinvîsî..
Wextê tu dîsa di pencerê re dinerî

Tu nas dikî
Ko tu mîna wî bûyî
Te baskê xwe dinivîsand!!

Limêj

Ka emê herin
Salkê li ser kolanan razên
Qunderên me wê biqetin ji meşa me
yî dirêj
Û çavên me wê timî ruhniyê bibînin
Wê tu cudayetiyê nema di navbera
şev û rojê de bibînin
Emê xewnine tije dar û bask bibînin
Û wextê vegera me
ji hemû aliyan de xelk dê bên
Bo di hinavên me de limêj bikin…

Ramboyê fernsî

Gerek Ramboyê fernsî li gundê xwe bima..
Wê Esyûbiyayê bihata mala wî
Wê ew germ kiriba
Û wê bajarê Senayê bi xaniyê xwe li keştiyê siwar bû ba
Û qurmizê mirinê
Wê ew tije qedehên evînê kiri bana.

Nav

Navê ba
Navê mirinê
Navê tirabêlkê
Navê şaxên hejîra bi toz

Komek nav di nav hev de ne
Kes wan ji hev venake
Girêdayî ne
Pel bi ser wan de diweşin
Û dîlan û girî
Navê çêbûnê û navê kalkê me
Xwedê…

PIŞTÎ BERFÊ

Emê di qorzîkekê de rûnên
ez û te tenê
Emê li hev binerin
Emê piçikekî li xelkê dora xwe
Guhdarî bikin
…
Dîsa wê lêvên te tije hezkirin bin
Tê ji xwe re maçî min bike…
...
Hêdî
Li wî bajarê biçûçik
Pişti berfê
Pişti meşa rokê sax..
…

Pişti kevirê bi rengine berê
Ne hatine dîtin
…
Pêsîrên kulîlkan
Û pişti ruhniya kaniyan
- **Ez pir dûr im**
- **Ez xwe nas nakim !**

Tu kî bûyî ?
Tu ji daristanekê dihatî
Hîn pelên daran bi te ve bûn
Gul ji destên te derdiketin
Tu kî bûyî !
Tu ji avekê kûr derdiketî
Hîn masî ji canê te dinqutîn
Dengê te wilo hêja bû
Wek
Kevirê kehremanê
....
Şibakak biçûk
Wê li piş me hebe
Wê mase gelekî nêzîkî masên din
Be…
Wê çekên sivistanê li me
Bin

Tê bibêje
- Qehwe ne xerab e
Ezê bibêjim
- Erê
Ezê rabim bo çixarenan
Bikirim…
…
Tu zanî bê çi min û te dikişîne
Cem hev
Lêvên te û lêvên min
Em herdu zirav in
Û baranek xemgîniyê hûr bi ser dilê
me herdûyan de
Dibare…
…
Ev heye salek sax
Ez her roj ji xwe re dibêjim
Ezê li ser wî wextî binivîsim
Dema li ser piskilêt dawiya şevê
Ji bajêr vedgerim
Yan bitenê li ser rêyên daristanê
Yên pir zirav dimeşim
Û
Ruhniya pêşiya oktoberê
Wisa

Dihile…

De ka alî min bike!!
Bo ez kari bim te
Binvîsim
Çilo ezê wî çiyayê
Tije berf
Û
Tarîtî deynim
Ser kaxezê??
Divê hezkirin min
Li bin guhê xwe xe
Divê ez
Biperpitim!?
…
Erê…
Qehwexane biçûk bû
Destên te biçûk bûn
Porê te diherikî
Bi ser wê êvarê de
Û
Bi ser masê de
Em westiyayî bûn
Ji rojek sax
Ji meşê

Em rastî hev rûnişti bûn
Û
li hev dinerî .

WEK PELÊ ÇIXARÊ

Tu keçikek biçûk î, destên te biçûk in, pozê te bi pitik e, guharekî pir biçûk di guhê te de ye, madê te timî zer e !

2

Paîyz bû, xanî û hewş û çêlîkên çûkan, heriya li ser cadên qîrkirî, nig bi herî ne, parîk roka pişti esir, enî bi herî ye, divê xanî bên seyinandin berî baran bêt, ez di nav heriyê de bûm dema min te cara pêşî dît !

3

Hezkirin çi ye !? Barana bi ser ruhniya rokê de têt yan paîyz e: divê her tiştên berê bimirin bo her tiştên nuh çêbibin, loma hezkirin êş e

4

Emîna bû, ev navê kevin, ev navê ko xwediya wî bi meşa xwe ruhniya niyonê bi ser çavên tijekeser de dibarand, ez li kêleka cadê rûnişti, zirav wek pelê çixarê ..

5

Ew bû, bişev ez ji malê derdiketim bo wê û çavên wê li mal bihêlim, bo meytê hezkirinê li malê bihêlim, ez dudo bûm…

6

Ez kî me ? Komek im û her carê mirêkek dişke ji bo ez pir bibim û Emîna jî pir bibe. Çi di jiyanê de

heye ji xeynî hezkirinê û şkestina van mirêkan?!!

7

Ez çi xerabiyekê mezin dikim, dema ez wêneyekê ji hezkirinê re çêdikim !! Ma gelo hûn giş nizanin ko hezkirin hezkirin e û ne hezkirin e jî.. ?

8

Av û ax

9

Lêv ji avê ne, xwîn in memik ji axê ne…

10

Ez bi te, bi heriya hezkirina te dilê ruhniya jiyanê diseyinînim, ez ji te pêve nema kesî dibînim

11

Ji lêvên te pêve, ji memikên te pêve…

GULKUŞTINA WÎ

Bê ko hayê te jê hebe ev av li vir e
Ba derbas dibe, xwe wek baskekî dihejîne
Bê ko hayê te ji te hebe, navê te nas dike
Jê bixwaze: bera bang te bike, lê ma tê rabe?
Wek bilûrekê nû: tu aniha wilo yî !
Bê ko hayê te jê hebe: çûkên nexwiyayî
Çîv-çîvê dikin...

****

Dar xwe dirêj dike, cihê wê yê wê ye, çûkên wê

Yên wê û avê ne.
Ew ne dêya çûkan e, ew textekî hişk e, bihna
Xwe li ba gola xwe derdixe, şaxên xwe yên herî
Bilind dilivîne, pir nîşanan dide ezman û
Ezman jî didêyê. Di navbera herdûyan de tiştek
Nîne: şînî heye-
dema bê dem e

***

Ez naxwazim li ser xwe biştexilim, naxwazim bibêjim
Bê rengê helbesta min do nivîsiye çi reng e! Naxwazim
Li ser dil biaxivim û êşên berî êvarî li bilûra gîha
Bixînim, û ne herim cadên berê, ne katjimêrên
Berê. Bêdengiya berê yan qîrînên berê…

**Ez destên xwe di vê sipîbûna aniha de vedikim,
belkî tiştek jî ne keve destên min, ne libek tiwê, ne
hêlanek jî.**

****

**Û ko aniha ev dema aniha mir, ev ba xwe di
Bin qurmên bêhnekê de qurnisand, daran
Rahiştin dismalên keskbûna xwe û çûne ezmanan
Û min bitenê li ser van sîkan hiştin!!
Ma dar xwhên me ne ko wisa li hemberî me
Tije hezkirin û bawerî disekinin? Û ko em
Di pencera vî xaniyê mezin re jî dinerin, ew
Me dibînin, guhdarî dikin li razê tirsa me!
Ma ji kû derê dizanin bê em ditirsin, ji**

Evîndariyê û ji bêevîndariyê, ji şevê û ji
Ronahiyê, ji yên din û ji xwe jî…

***

Yê helbestvan dîn bibû bi hatina buharê re,
digot, binerin, va şaxên dilê min kesk bûne, va
laşê heriya çûkên min vedije, û va genimê hezkirinê dibe gîha di çavên min de,
va keçên min li wî aliyê gulistanê ji min re
destên xwe bilind dikin, ji min re ramûsanan
dişînin. Stêr û ava rokê vedixwim û bi veşarên
ba re radizêm. Ez perîkek im, hêsirek ken im,
hêlanek im, zarok min wek minminîkan diweşînin!
Yê helbestvan dîn bibû... û di xwezayê de

Wek ko di mirêkekê paqij de xwe didît.

****

Wê êvara havîna par, wê êvarê, dema avê
Xwe ji bîra kiri bû, dar şiyar bûn, bilûrê xwe
Digihand destên evîndaran, li kêleka pirê
Xwîn di şûşan de bû, firindeyekî avê hati bû
Kuştin...

****

Bi şaxekî darê yî jêkirî buhar bû,
bi gulekê pir zer, hezkirin bû...
Dişibiyan destên payîzî, kirasê wê li ser
Stêrkan difesilandin. Em herdu bi hev
Re difiriyan, ew bi aliyê evîndarekî nû,

ez bi aliyê helbestvanê dîn de, kulîlk kom
dikirin û agir bi wan dixist, dibûn buhişтek,
agir bi buhişтê dixist, dibû helbest, xwe
davêt nav wê…
Bi gulekê pir zer xwe vedimirand
Bi gulekê û bihnekê hingulîskane…
Ya jê hez dikir di ber zivistana wî re diçû
Xemilandî bû bi gulkuştina wî.

***

Ezê te derbixim ser vê rêya tazî, dilê ko bûye gîhayê
Hişk… hilkişim ser dara evînê, xaniyê biçûk yê
Bi heftsed navî, em xwe nabêjin
Em kuştiyên avê ne…
Em kuştiyên êvarê ne…
Û destên xwe me bi xwe veşartine…

***

Em kuştiyên fincanên qehwa tehl in !
Li kêleka me evîna me ya par…
Kuştiyên rêya dibistanê ne û şevek helbestan…
Zengilên zaroktiyê ji dengên me dikevin
Û keroşk li hemberî evîna me dibişirin.
Em kuştiyên dara bihîva ne, ew a tenik li ser
Girê Moza…
Û kulîlkên wê yên sipî…
Em kuştiyên sibehekê xweş mîna nanê tenûrê
Li ser êvara gundekî ne û
Em kuştiyên xwe ne, dema di evînên kevnar de

Em xwe dinasin, li hespên havînî siwar dibin
Û li xewnên kulîlkan!
Em kuştî ne…
Xwîna me tê nivîsandin û dibe
Strî û newal û qehwe û hevaltî…
Em kuştî ne û wilo sax in, ko aniha ev
Êvara mezin me bi xincerên sîkên xwe yên
Şil diêşîne, û dar hemû xemgîniya binê zemînê
Davêjin ser dilên me…

***

KULÎLK

BO HOLGER SCHWENKE

Bihêl ew kulîlk wek te be
Di bîra te de
Herdem tu jê bî …

Ew kulîlk ne di bêrîka te de
Li ser riwê te, bûharek û daristan
Serê xwe ji xwe re

Ew kulîlk ne kulîlk e
Ew odeyek e...
Ne odeyek e
Ew bêhnek e
Û hingulîska sermê

Bihêl ew bêhna han
Bê ode û mifte
Bê rê û soz
Wilo tenê bêhna xwe
... tenê...
Wek berê

Aniha û ne
Timî, hilkişandina derencan
Rûniştineke kurt, bask tenê
Dizanin bi me

Veşêre vê kulîlkê di balîfa
Destên xwe de li kêleka te
Bêdeng e…
Agirê ko di dilên xwe de dadan
Venemirî…

Dîsa veşêre vê kulîlkê
Di kû derê de ?
Ewê te derxîne bi wî agirê
Han, yê dûr

Dîsa bang wê bike

Di qirika xwe de
Kulîlk ne dîn in
Kulîlk nas dikin

Li ser derencê
Ya sibê, ya ne a te
A baranê, berî do dîsa bê
Do yê herro

Kulîlka te wê rahêje te
Te li vir û wir danayine
Wê bi te derxe
Razê wê li cem wê…

Heger hûn dudo bin
Wê daneynin kêleka hêsirên
Do...
Bêhna wê dernakeve
Wê nexine sibe
Wê li ser bera aniha
Bihêlin mîna xewê..

Rahêje kulîlka xwe
Û xwe derxe di banê xaniyekî re
Belkî qitik…

Belkî kulîlk a te be

Belkî tu tu bî
Û ko do wilqasî şemitî be
Nav ba.. tu nema dibînî
Bizmarê ba, nexşê sermê…

Belkî ew kulîka han
Daristana jiyana ba
Çûkek û şaxek û pelek
Û destek xweşik jî
Belkî…

Belkî lêveke li vî aliyî
Sor, qirmizî yê kulîlkê
Û yê berfê
Sor-sipî, devê kulîlkê
Lêva ba û xatûna pel

Belkî
Ew minare ko destek ket
Nerîna ji nivkê de
Nerîna zelal a kulîlka dawetê

A aniha bi te re wek
kulîlkstanekê…

Û têbê tu ne tu bûyî
Te xwe da talda daristanan
Û tu mayî…

Û timî ne wek xwe
Tu li kulîlkê digeriyayî
Û bêhn û derence
Hildikişiyan sibe û sibnadisib
Tu mirêk tinne bûn
Kesk û rengek qehwe...

Kulîlka dîwêr û
Şibakê û a soz û destekî
...

Bera pirnêzîk
Lê pir dûr bim…

1

Hîn divên em bêhna lewenta stranê,
Meşa wê di nav piling û şêrên
Daxwazan de…
Hîn divê ew êvar hebe…
Ew rû… deng…
Hîn divê helbestvan li hev bicivin
Û helbestan vêxin…
Hîn divê minara dilan carê
Azan bide…
Divê çav biçirisin
Dest bigihên evîna hev
Divê tembûr hebin…
Hîn divê dema xwe daweşînin

Stêrk hebin…
Hîn divê – tu bi min re bikenî-
Hebe!

2

Devê ronahiyê mûzîk e, û destê
Darê gumlekê darê datîne erdê
- Em li ber vê dara mezin em
Bi xwe ne an em ên carekê em
Bûn
- Me derî vikir û
Em ji biçûkaniyê hinekî keniyan

…
- Me bazda û ketin newala dil
Newala dil jiyan bû, dil
Kesk bû, xanî derewek
Xweşik bû… derewek mê bû
Rastî nêr bû, me jê hez
Ne dikir lê ji jiyanê, ji
Derewa rastiyê

…

Kî ne ev ên vê şevê
Pêde roj in?

3

Daristan xwe biçûk û henekçî
Dikin û ew di wan re diren
Tê bêje ew çavkaniyek e
- Xelk digihêjin hev, vedixwin,
Dixwin, direqisin, ew nabîne
Ew kor e, nabihîze, bê hiş e
Ew mirî ye, ew nema ew e…
Bûye bêdeng wek serê çiyan
Bê jiyan wek kûrahiya newalan
Bûye veşartî wek baskan û
Ba
Bûye rast wek jiyanê
Xelk têde dijîn tê bêje ew
Yê herî sax e
Ew helbestvanê xwe ye!

4

Ez nabêjim ji ber te nabînim
Û heke te bibînim dîsa nabêjim
Ji ber tu yî.
Ez te nabînim ji ber tu herdem
Li vir î… herdem li vir î û
Ji te hez nakim ji ber bêhawe
Wisa dikim…
Di esrekê de
Te dibînim…
Nas dikim ko ji te hez dikim
Nas dikim ko her dûr dirim
Nêzîkî te dibim û her
- lêvên te maçî nakim
zêdetir û xurttir xewna te me.
Di esrekê de te dibînim
Di esrekê de berî neh salan!

5

Min baş li çavên te nerî
Li porê te
Lêvên te xemgîn bûn
Hinekî porê te di nav ewrên
Xewnan de bû… erê tu
Keçikek helbestvan î…
Destên te bangkirin in
Memikên te kulîlk in
Û tu kulîlkistan î…
Tu carî tê vê helbesta min
Nexwîne û heke te xwend jî
tu dê nizani bî ko ji bo te ye!!
Û li ser te ye
- keçikek helbestvan î
Nenûkên te keroşk in…

6

Ji bo ko av, pira avê, êvar
Xaniyê êvarê, ji bo meşê û
Nerînê, ji bo rê, darê, ji bo
Çûk, kurm…rojek dî
Rojê dialêse, minminîkek
Dî textê razana xwe di
Hewşa me de vedigire, ji bo
Havînî, ji bo em bibin dê û
Bavê xwe û zarokên maran
Ji me derkevin, ji bo zarokên
Beytikan ji dilên me bizên…
Ji bo newal ji me bizê…
Mîna erdê em wisa bi av bin
Mîna ezman wisa bi ba bin
Bo em bimirin û wek kevokê
Bijîn…bo wisa…

7

- Ez aniha dema min xwe li ser
Giya dirêj kir- min nas kir:
- Zarokên zarokên min dê bidin
Dû vê minara laşê min
- Zarokên zarokên ewran dê
Di tirba min de razên
- Zarokên zarokên vê rokê
Dê di xewna jiyana min de
Bin…
- Dihesim- bi gumlekekî spî
Û bejneke dirêj- mîna
Birûskê û baranê …
Sed helbestvan di bin
Zimanê min de ne
Sed zarok di dilê min î kesk
De distirên.

8

- Biner hevalê min, biner dilê min!
Simbil xwe li ber ba xwar dikin
Bi çepê de. Dil xwe li ber
Evînê xwar dike bi aliyê rojê de
- Biner leglegê girî…!
- Biner dara demsalan…!
çavên xwe hilde û li dûr temaşe
Bike. Ez gundekî û hinek
Mirîşkan dibînim û mizgeftek
Hilweşiyayî, ez tirabêlka tirimbêlekê
Dibînim, ez nêrdewana
Bîranînan li ser dîwarê dil
Û li ser gepek nanê
Tenûrê dixwim…

9

Sozekî bi min de ey gula hîroyê
Û bera ez li ber roka bendemanê
Bêdawî şiya bim…
Sozekî bide min ey hîroya
Orta zengil û saet û dayikê…
Û bera bê xew û xwarin
Bimînim mîna xilqa jiyanê
Sozekî li qirika pişika min
Girêbide gula hîroyê û bera
Tenê di hindurê pişika te de
Şiyar bibim, bera ez ez bim
Û ez ne ez bim, bera şevreş
Û ronî bim, kanî û biyaban
Bim… !!!
Bera saet û gerşikestin bim
Sozekî bide min hîroya malê
Bera ez ez bim û mirin bim

Bera pir nêzîk
Lê pir dûr bim… !!

10

Nerîn: nerîna kulîlka li ser
Masê ye
Ode: pir biçûk e, ba pir
Caran li têlên dengê wê dixe
Helbestvan: ne ez im, bîranîn
Û pêşeroj xwe şîrove dikin
Sir: divê hebe, ko nebe
Ka kî dê di gulan de
Avjeniyê bike…
Xweşikî: keçika helbestvan e
Lê ma keçikên nexweşik hene!?
Esman: em in ko kari bin
Hîn tiştan di xwe de bibînin û
Ji yên din re diyar bikin…

11

Ode vala ye…
Zengilê valayiyê lêdixe
Bi heft rengan
Werin vê odê…
Werin têkevin bîra
Van sûretan…
Oda havînî tê de xwezayê
Buharek dirist…
Ma em odê vala bihêlin
Da helbestvanê mar havînî
Bê xwe tê de vezilîne…
Ken…ken…
!!

SIPAS ELIOT:

Ziman çi xweş in!
Binerin, av, keleheke[2.] pir kevin
Berê, aniha û dengê strana berê…
****
Bo tu birastî bijî ey helbestvan
Bera hayê te timî ji helbestan tenê hebe
Her tiştî ji bîr bike...xwe vezilîne di bin
Roka destên helbestan de, qîrînên bi şevê,
darên bi şevê, avên xewnan...

[2.] Ne keleh e, xaniyek e, lê evîn bi kirasekî sipî û baskên avê wê vêdixe...

Erê û ko tu çûyî kîjan civatê jî, tenê behsa
Wê bike, ew a bi lewnta pirr buha lingên te dişo
Û bi porê[3.] xwe zuha dike...
***
Pirtûkên kevnare, şûşene kesk î vala,
Kolanine kevirî, seriyekî Lênîn[4.] ji cebsînê,
Kevokine, merovên pordirêj î baş, kûçikine[5.] baş jî,
Ew gîtara li dera han wek dêrekê[6.] dirame,
Hingulîska ne hat kirîn, jiyanên ne hatin jiyandin ên me,
Em ên baş…mîna vê sibeha sebtê[7.].
***
Bê pênûsek yan bê kursiyek, bê dareke

[3.] Ne porê wê tenê, her derê wê
[4.] Pûtekî wî yî qerase, her polîs wî di bin axê de vedişêrin, hinek tên û dixwazin wî derbixînin û bibin jê re perestiyê bikin…
[5.] Dema tu ne li bajarê tu lê ji dayik bûyî bijî, kuçik wateyek din ji wan re heye...timî baş in…
[6.] Xaçperestgehek herifî bi axê lêbûyî bi naqosine ji payîzê…
[7.] Roja helbestan e...qehwexaneyan û ....

Li Qamişlo[8]…
Bê ew evîn …a tunne bû, bê havîn,
bê nexweşî
a evîn bixwe bû…
Ew nexweşiya ha, ax ew dara bêdar,
Qamişloya bêqamişlo,
kursiya bêkursî, ezê bêez…etc.
Mûzîka pop dikare carinan min ji
min derbixe
Mîna çirakê.
***
Bera dîsa… dilê min wisa dinivîse,
dil…!!
Dîwarê dibistanê ye, yê keçikê dixe
nav hemêza
Ba..
Pişti nîro…
Xelkên min
Yên derdikevin ser bênderan û
henekan bi darê
Ve girêdidin, nema ez we nas dikim,
tê bêje ez di nav

---

[8] Divê carê behsa dilê xwe bike, dilê bi dilên xatûnan, yên mîna kildankan û tawisan

Tirênan de ji dayik bûme, ne wisa tenê, xelkên min
Nerîna we jî li ser qemîsê min hişk bûye wek
Xwîna gurekî[9] har...
***
De herin… herin… herin!!
Di aso re derkevin, bibin aso
Bo nerîna min kari be we hembêz bike
Ey bîranînino, ey şewqino…
***
Niha helbestvanê herî rast, ez dê çîroka wî
Ji te re vebibêjim, tu ey ê ez aniha bi te re me, mîna
Hevalekî.
Tîmî wî dinivîsand, xurt bû, beran mîna xurtbûna wî
Bûn û bizin- ew pir bi mû bû !
Distira û distira…
Lê sekinî, av mîna sekinandina wî bû

---

[9] Belkî ne har be jî…

Dixwest tenê bistirê, got: Stran ne man!
Lê ne rast bû…stran pir bûn, ew ne ma !
Gundên bêbaran mîn wî bûn…
Û dînekî band kir di biyabana deng de:
- Helbest ne stran tenê ne…dîno !![10.]
****
Çimkî tu yekcar ne bûyî ya min, xweşikbûn bixweyê…
Pîrekê- keçika berê, ew berê han, ê li xwe dilikûmî
Û pir fediyok bû û helbet jî tenê bû, bilûr bû, şêxek
Bi maran re dihejhêjî, mar bilûr bûn, ew dûman maran
Bû, giya ji pozê wî derdiket û wî difîkand…
! Tu li bendî çîrokekê yî ?
****
De emê çîrokê bibêjin…

[10.] Ev nerîna min bi xwe ye...û ev helbest li ser vê nerînê ava bûye

Ev gurên ko kom bûne li dora min çi ne!!
Û bajar jî, ……., pîrek û bizin û elok
Û masî jî bi minarê ve hildikişin.
Binere! Sibeha cejinê, hîn mellêsibê ye, tekbîr
Xwe li deriyên dikanan dixin û tirs jî derbasî nav
Lihêfan dibe, dîk tênê şerjêkirin, tirên dirin, kurk
Li Helebê dimîne, bavê min û dêya min…
Hûn helbestan dixwazin?
…
****
Ez dixwazim te vê esrê, esra fireh, piştî dawetê,
Piştî ew xortê min ew nas ne dikir û min silav lê kir
Ji ber min ji te hez dikir, yan dara tiwê ya ez hilkişiyam ser û min li te nerî..lê tu li ser darê bûyî, ne dara tiwê

**dara evînê, ne dar, xaniyê hezkirinê,
yê ko kirasê te ye, ewê sipî, aniha
qetiyaye?...Bûka mêşên hingiv û
minara masiyên sipî mîna zêr...zêrê
te ê çewalrahêjan û mîra....**

****

**Ew navkên xurman, ên keroşk li wan
diketin...
Ew tenûra dêya min, ya wênên
Biroslî lê diketin...
Ew sindoqa bavê min a teneke, ya
tije zêr û zîvê Xwedê...
Ew piskilêtê min, ê sor, ê me ew
havînî sinet kiri bû...
Ew telîsê tije helbest û evîn yê ko
min ew li xwe dikir
Her di ber te re derbas dibûm...
Ew mirêka ko te xwe tê de veşartiye,
aniha bûye Amûdê...
Amûdê bûye rovî, keroşk bûye qîza
apê min...
Diranên me ji hisrim re amade ne...
Her kes nakene bi ew pisîka çêlîkên
xwe dixwe mîna
Şoreşekê di kiştibanan de.**

Ke...ro..ş....kk.

***

Ez razayî bûm, dema André Birîton ew name ji min re Şandi bû, digot: Ev cara yekemîn e ez nameyekê ji te re Dişînim..netirse! Ez li ser çiyayekî dirêj û bilind bûm Min li stêrkan dinerî, tazî bûm û tenê şalek li dora qirika min bû, bi zekemê bûm.Erê birêz Birîton…min digot: Ev çi biyaban e, mar bi min venedaye, ez ne ez im! Ne mîr im, ne biçûk im, ji goştê keroşkan hez nakim ne ji yê berxan. Sindoqek cilan ji min re şandi bû û kilîta kenê Keroşkan[11], min ken vekir û derbasî vê filomarkitê bûm.

---

[11] Keroşk û xewn wek hev in!!Hevaltiya keroşkan bike, bo tu binivîsî??

FIREHGERMEZMAN

(têkst)

Qazên bejî dişţexilin, ji min re dibêjin:Tu çawa yî lawiko?
Ez we nas nakim, hûn kî ne?
Em av in, em dar in, em berf in!
Ez tê ne gihişţim...
Deriyê zindanê rojê carekê ji te re vekirî ye, tu karî derkevî bajêr
Û ji xwe re hinek piran bibînî

Ma ezê çi bikim ji piran, pir nayên xwarin, ez birçî me!
Dilê min dire qedehek şîr û hinek şêranî. Ev heye sê meh devê min bi şêranî ne bûye.
Hinek helbestên min bi min re ne. Ez wilo ji qazan re dibêjim
Ma emê çi bikin ji helbestên te? Em li ezmanekî fireh û gerim digerin!
Helbestên xwe ji wan
Kesên ko bi te re di zindanê de ne bixwîn!
Ew di wan de nagihên...hevalên min dibêjin: Helbestên te wek girara tisî ne...nayên xwarin!
Ma ev tişt rast e?
Ez nizanim, belkî rest be, hevalên min di zindanê de wek min birçî ne...
Dema di hinek wek we xweşik de diramin, di goştê we yê biraştî de, di sînga we ya biraştî de diramin, ne di baskên we yên di ezman de wek xewnekê difirin, ne di bangkirina we ya kesk de, ne di şînronahiya henekên we de.

Ha ha, wilo, lê em bilind in û destên hevalên te nagihên me û ew jî di zindanê de ne!!
Erê rast e û ez û helbestên xwe jî li binî ne, em bi tenê ne...
Xem nake lawiko... bêhna xwe fireh bike! Ta ko baskên helbestên te xurt bibin û tu û wan
Bi jor kevin, ber bi me de
ber bi firehgermezman de...

A WÊ... A WÊ

Rêya ko li bendî çûkê xwe dima, dimeşiyan û li ser baskên xwe agirek didîtin, ne tenê bûn simbil, rîhan, indeko, tirêna berêvarî, destê we bûn çûkino, baskên êvarî bûn hevalên giya, rê a we bû, êvara ko di newalê de dişemitî, li me ne dinerî, hildikşiya çavine li aliyê din, ez kî me li paş vî destî mame, li paş kulîlkên çavên te, hêsirên te, û ji nivkê ve ko ne ma tu hatî, ne ma em

bask bûn, kevirê sipî ê binê ezman, ezmanê newalê, keçik û xort vê buharê, sorê êvarî daket bi ser gumlekên wan, sorê dilê min bang kir, sorê tirêna ko di vir re derbas bû, em in, kevir, qûm, tu ey lêvê, şêrîna ezmanê xwe, şêrîna mirêka bê nerîn, di hindurê vê dûmana gulan, tu tenê a ko ev baskên ha, ev melayketên sor, lêvên te ne, ez dizanim, te, ko li ser vê rêyê, bi pirtûka bekeloriya, min xwe avêt vê helbestê bo mîna nan, mîna xiyar û bacanan, mîna nanê sêlê bişewitin, bo xwe ji te re bixwînin, bo em pemboyê nerîna te a pêşî û a dawî, li ser girekî bêhawe nizim, her xwe dadixim, li bendî baskên çûk, her xwe vedişêrin, te dibînim, di vê hermelê de, a bêhna par, a bêhna çekên te, berpêsîrên te, lewenta, hêsirên porê te ne kulîlk, ên zer, her li çûk dinerim, wî di hindurê baskekî pir biçûk de dixwînim, û tu pê re yî, her li aliyê gir dinerim, şewata vê

helbestê, vî zengilê dengê strana çûk, û gir, ew gir ê ba, ê ba , ê nizim, her gir ji sînga min dadikeve, xwe û te dibînim, bê baskên: ez û te, ax wê havînê, bi guleyên qeresiyan, ax min bang te kir, xweşika nav rezan, ax wêneyê germê, a dil, a ba, ne tê û ne netê, ne xwe hinekî nizim dike bo ev çûkê ji salkê de li ber hêsirên min hinekî bifire, bo bibîne ko ez hema mame, hema vemirîme, hema xwe mîna kulîlkê, bêhna te dikim, çavên xwe yî çepê wisa şil dikim, da nebêje çûk, ev çûkê din e, min bang wî dikir û wî xwe têr di xewê û xewnan de difirand, xwe dilikumand, da bibêjim: ew jî mîna min birîndar e, xwe davêt hemêza ezman, xwe fedî dikir, wî hîn ji te hez dikir, û min xefka dilê xwe jê re veda bû, li binê memikên te, ên spî wek evînê bi xwe, ne diketê, lêvên te nas ne dikir mîna min, ne pêsîrên te dîti bûn, ne bêhna stiyanê te kiri bû, tenê difiriya, bi baskekî tenê, û carna

digiriya ne ji ber te, ew çûkê belengaz, ji xerîbiyê, ji xwe, wisa, bê wate, ez û wî û te, xefka ko min ji me re li binê gir vedida, kes ne diketê, ne çûkê hezkirina te, ne ezmanê stêrên Girê Moza, ba, ax bayê ji ber porê te dihat, di ser malên gund re derbas dibû, tije qurnifil, tije nanê tenûrê, bayê bejna te bû, tije bêhna bûhara Birîva, newalek sax ji şoqilên çola Amûdê, ax bayê rûyê te, tu bixwe bûyî, nerîna te tenê bû dihat di ser baskê vî çûkê…, xwe davê vî aliyê xefkê û wî aliyî, çûkê barana pir zivistan, li binê gir, şewatên agirên mirêkên newrozê, şewata dilê çûkê bêbask, xwe davête vî aliyê pêsîrên te, nikilek li bala te dixist, ji çavên bihêsir û ewrên xefkan nema te nas dikir, dihat û di ser xaniyên gund re bang lêvên te dikir û tu diçûyî mala helbestan û stranan, newrozên me li aliyê xefkan dişewtîn di dilê gir de, di binê binî ê şewatê de, ax

**şewata xefkan!! Ax çûkê bêhawe!!
Te çi kiriye ji baskê evîna xwe î par
Te li kû hiştiye gir û biyok û sînga
Topiz û Birîva ? Ax sînag gir, te li kû
hiştiye çûko, rebeno tembûra
êvaran ? Ax tu bûyî ey bayê bejna
wê, ê ko ji nivkê de aniha hinekî bi
ser canê min de, şibaka dilê çûk
vêxist û şewitî bi bihna wê, a wê, a
wê……**

Jibîrkirinek

1

3 helbest
Ji erebî: Zîn Emîn

**Zirav bûne weke tayê bêrîkirinê
Ji bîr kirin dîwarên ko jiyana wan ya
yekemîn
Dorpêç kiri bûn
Ji bîr kirin tîpên resen yên ko bû
bûne kenar ji zimanê wan û
Kolanên reş û tarî re**

Ji bîr kirin ken û girî
Ji bîr kirin ko ji hevalên xwe re bibêjin: hûn bi xêr hatin û xwe bitewînin
Da ko gulekê bêhn bikin û
Guh bidin keriyên xwe
Ji bîr kirin amadekirina ji zivistanê re
Ji bîr kirin ji dayikên xwe re bibêjin:
Dayê!!! Dilê min diêşe!
Bûn ko êdî ne ma dikarin rabin ji deştên kesk, yên kujer.

Sed kiras
2

Çawa xwe qenc veşêrim di peyvan de
Da tu min bibînî?
Çawa bêdengiya xwe vêxînim, weke ko di devê min de birîndarek be?
Çawa derbasî pelên xewê bibim, da te bikim xewa xwe?
Çawa bimeşim û di hemêza min de gul?

**Da ko tu min biçinî bi destên xwe!
Çawa xwe bikujim di navên te de
Da her tu binivîsî min?
Çawa te bibînim di eynikekê de ko di
laşê min de şkestî be?
Tu sed destên spehî yî, sed kirasî
tu, sed bayên ku hinekî kiras
hildidin.**

Çivîk û helbestvan
3

**Bager wê min bavêje dilê xwe
Wê dar gumlekê min ji min bistînin
Çivîk, wê yek perîkê bide min
Demsalên mê, wê gelekî min
ramûsin
Bêdengî keçekê zêrîn wê bide min
Û sûkên derengmayî wê têlekê dawî
bidin min
Ezê meyxaneyan bidim zengelorka
xwe
Hêlînên ko me di berfê de çêkiri bûn
Wê hêlînên xwe bidin me**

Havîn wê meyweyên xwe bi ser min de dawerîne
Û ez… rêyên teng im di helbestan de!

Ko hema bimirim

Ji
Lêvên te be ji bêvila te be ji tazîbûna te be
Tazîbûna te be destên te bin lêvên te bin ji şemsiya
Kirasê te be..
Tiliyên te bin ji tu bî be ji nerîna te be
Ji bişirîna te be ji libendemina te be
Ji te be cade be
Ji te be berî heft salan be
Ji te be bişti bîst salan be
Ji te be kenê ewilî be

….
Hema bimirim
Ji çogên te wiha bedew
Ji te ne bînim û ne nas bikim
Ji ne ji te hez bikim be
Ne te bixwazim
Ne te bizanim be
…